**KiTa Bremen**
Navenda Zarok û malbatan
a bajarê Bremenê

KiTa Hêlîna Zarokên Biçûk
KiTa Baxçeya Zarokan
KiTa Fêrgeha Zarokan
KiTa Hevdîtin
KiTa Malbat

KiTa Bremen, Auf der Muggenburg 5, 28217 Bremen

Ji bo dêûbavan
Navenda zarok û malbatan a Hêlînên Bremenê

Referans — Agahdariya ji bo dêûbavan a li ser xizmeta acîl

Tarîx

Kesa Peywirdar — Wolfgang Bahlmann, Rêvebirê Saziyê, Rêveberiya Aborî
office@kita.bremen.de

Dêûbavên hêja,

Armanca KiTa Bremenê ew e, ku xizmeteke lênêrînê ya baş û pêbawer bide zarokên we.

Lê dîsa jî dibe ku di xizmeta li navendên nêrênîna zarokan a danê rojê de ji ber kêmbûna xebatkaran carinan rewşên zehmet di plansaziya xebata xebatkaran de û di ewlekirina peywira lênêrîna zarokan de derkeve.

Bi taybet di dema pêla enfeksiyonan de û bi gelemperî ji ber kêmbûna xebatkarên pispor dibe ku kêm xebatkar amade bin, ku ciyê wan nikaribe were tijekirin. Ji bo ku em ewlehiya zarokan teqez bikin û hat ji tenduristiya xebatkarên xwe hebin, rêveberiya we ya Navenda Zarok û Malbatan di rewşên wisa de mecbûr e, xizmete ji bo rewşên acîl pêşkêş bike.

Têgiha xizmeta acîl di nav xwe de tevahiya tedbîran dihewîne, da ku di rewşa kêmbûna xebatkaran a neplankirî de xizmeta lênêrînê bi berdewamî were pêşkêşkirin û parastina zarokan û peywira lênêrînê were ewlekirin. Hejmara herî kêm a xebatkaran a li gorî BremKTG (Qanûna Navenda Lênêrîna Danê Rojê û Lênêrîna Zarokan a Danê Rojê ya Bremenê) bingeha vê ya hiqûqî diyar dike. Di nav vê de diyarkirî ye, ku divê zarokên hêlîna biçûkan û komên berfirehkirî yên li gorî temenî, herî kêm ji aliyê du xebatkarên pedagog ve xizmeta lênêrînê bigirin. Divê ji bo komên temenên ji 3 hete 6 salî, ji bo 20 zarokan herî kêm xebatkareke/î pedagog amade be.

Li gorî hejmara xebatkarên nikarin bixebitin, ji aliyê rêveberiya Navendên Zarok û Malbatan ve ev tedbîr tên standin:

1. Dorbisînorkirina çalakiyên pedagojîk
   (mînak betalkirina seyranên plankirî yan jî piştgiriya takekesî ya zarokan a yekkesî ya di pêvajoya perwerdehiyê de)
2. Dorbisînorkirina demdirêjiya lênêrîna zarokan, mînak bi riya betalkirina xizmeta sibehê zû yan jî piştî nîvro yan jî bi riya dorbisînorkirina demdirêjiya lênêrîna ya li gorî demeke diyar.
3. Lihevcivandina koman an jî girtina koman.

Adresa Postê
KiTa Bremen
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361 5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

Tram
Xetên 3,5
Rawestgeh
Eduard-Schopf-Allee

KiTa Bremen
Şîrketa xweser
a bajarê
Bremenê
Rêvebirê Saziyê
Wolfgang Bahlmann
Cîgira Rêveberiya Saziyê
Petra Zschüntzsch

Deutsche Bundesbank
Beşa Hannoverê
IBAN
DE09 2500 0000
0025 1015 66
BIC
MARKDEF1250

Hejmara xercê
60-100-07915

USt-IdNr.
DE322325940

Kîjan zarok an jî kom bandorê ji van tedbîrên xizmeta ji bo rewşên acîl digirin, dê ji aliyê rêveberiya we ya Navenda Zarok û Malbatan ve were diyarkirin, ku rewşa li wê derê li ber çavan were girtin.
Ji bo vê yekê hem xebata dêûbavan û hem jî krîterên civakî dê li ber çavan werin girtin.
Gava derfet hebe, hingê em ê li gel meclîsa şêwirmend a dêûbavan li ser vê yekê li hev bikin.

Wekî din em ê tiştê ji destê me tê bikin, da ku rewşa xebatkaran baştir bibe û pê re ji bo zarokên we lênêrîna xizmeta asayî ya pêbawer were ewlekirin.

Bi hêviya xweşbîniya we.

Li gel Silavên germ,

Wolfgang Bahlmann
Rêvebirê Saziyê, Rêveberiya Aborî

KiTa Bremen
Navenda Zarok û malbatan
a bajarê Bremenê

Adresa Postê
KiTa Bremen
Auf der Muggenburg 5
28217 Bremen

Telefon
0421-361
5700
Telefaks
0421-361 59771
E-Mail
office@kita.bremen.de
Internet
www.kita.bremen.de

*[Übersetzt in die Sprache Kurdisch]*